
| | |
|---|---|
| <br> | **Seyrana dibistanê**<br>ji Paul Maar<br><br>übersetzt von Mahmut Aydin |
|  | Tîna û Tîm heval in.<br>Û ji vê sala perwerdehiyê ve, ew herwiha di heman polê de ne.<br>Navê mamosteya wan Xanim Bode ye.<br>Xanim Bode pir dilgerm e. Ramanên wê  baş in. |
| | Ew bi polê re seyranekê plan dike. Hin dixwazin bimeşin, yên din dixwazin ku bi otobûsê biçin.<br>Xanim Bode dibêje, "Çêtir e ku em herduyan jî bikin."<br>"Em ê bi otobûsê biçin daristana Steigerwaldê. Piştre em ê otobûsê li kêleka daristanê bihêlin û ber bi kavilekî ve biçin."<br>Jörn dipirse, "Divê em ber bi kîjan erqê ve biçin?"<br>Tîna sererast dike, "Kavilek e. Ew xaniyekî kavilbûyî ye."<br>Xanim Bode serê xwe dihejîne. "Erê, ew bermahiyên keleheke şovalyeyan a kevn in. Dîwarên pir stûr û bircekî bilind." |

| | |
|---|---|
|  | Sibeha Çarşemê, her kes li Schillerplatzê dicive. Otobûs li wir rawestiyaye. Em tam di dema xwe de diçin.<br><br>Piştî sê saetan, otobûs li kêleka daristanê radiweste. Şofêr dibêje, "Ez ê li vir li bendê bim." |
|  | Çend kesên ji polê dixwazin birevin.<br>Xanim Bode bang dike: "Ne ewqas bilez! Dema ku em niha di nav daristanê de dimeşin, rêzikên jêrîn derbasdar in:<br>Em bi hev re dimînin, kes bi tena serê xwe nareve.<br>Û kes ji rê dernakeve.<br>Li vir, nava daristanê bixeter e.<br>Ez naxwazim yekî ji we winda bikim.<br><br>Ma we ev fêm kir?" |
|  | Piştî demeke meşê, ew digihîjin cihekî gelek devî lê hene.<br>Bastian pêşî wan dibîne û diqîre, "Tûşêmî!"<br>Yên din jixwe li devî ne û devê xwe bi tûyan tijî dikin.<br>Xanim Bode dibêje, "Pênc deqeyên we hene."<br>Piştî demekê, ew gazî dike, "Baş e, bes e! Divê em berdewam bikin." |

| | |
|---|---|
|  | Dema ku ew dîsa di rê de ne, Tîna ji Tîm re dibêje, "Xemgînî ye ku em neçar man ku em biçin. Tûşêmî pir xweş bûn!" |
|  | Piştî deh deqeyan, ew digihîjin kavilan.<br>Pêşî, her kes hildikişe ser bircê.<br>Tîna û Tîm diceribînin ku tifa wan çiqas dem digire ku ji serê bircê bigihîje erdê daristanê.<br>Dema ku her kes vedigere xwarê, Xanim Bode dibêje:<br>Em ê li vir nîv saetekê bêhna xwe bidin.<br>Niha hûn dikarin nanên xwe derînin.<br>Lê ji kerema xwe li vir bimînin. Bila kes neçe!" |
| | Tîna li tiştê ku dayika wê bi wê re şandibû dinêre. Axîn dike, "Na, na." "Nan û penîr!"<br>Ji Tîm dipirse, "Tu ji penîr hez dikî?"<br>Tîm bi ken bersivê dide, "Erê, ez hez dikim."<br>Tîna ji Tîm dipirse, "Em ê biguherin?"<br>"Erê, bê guman," Tîm dibêje, û hîn bêtir dikene.<br>Paşê nanê xwe nîşanî Tînayê dide: Ev jî penîr e!<br>Tîna dibêje, "Ez ê ji xwe re tenê çend tûşêmiyan bînim."<br>"Ev ne pêkan e," Tîm bi dengek nizm dibêje. "Te bihîst ku Xanim Bodeyê çi got."<br>"Ew ê qet ferq neke," Tîna bi dengekî nizm dibêje.<br>"Heta ku bêhnvedan biqede, ez ê vegerim vir."<br>Ew bi dizîka direve. |

| | |
|---|---|
|  | Tîm li bendê dimîne.<br>Piştî demekê, Xanim Bode dipirse, "Gelo hemû li vir in?"<br>Tîm bi lez û bez û bi dengekî bilind diqîre. "Erê!"<br>Xanim Bode dibêje, "Çêtir e em bijmêrin da ku bibînin ka hemû 29 kes bi rastî li vir in."<br>"Kî pêşî dest pê dike?" |
| | Elvîra bi dengekî bilind dibêje "Ez." û diqîre, "Yek!"<br>Bastîan diqîre, "Du!"<br>"Sê!" Ew Achim bû.<br>Tîm diqîre, "Çar!"<br>Û wisa berdewam dike.<br>Tîm difikire, "Hêvîdarim Tîna zû were.<br>An jî Xanim Bode dê ferq bike ku em tenê 28 kes in." Eva diqîre, "Bîst û heşt!"<br>Demek bêdengî çêdibe. Paşê Tîm bi lez û bez diqîre: "Bîst û neh!"<br>Xanim Bode dibêje, "Baş e. Wê demê em temam bûn."<br><br>Kesî ferq nekir ku Tîm du caran hejmar got. |
|  | Xanim Bode dibêje, "Em rêyeke kurttir digirin."<br>Tîm pir, pir hêdî dimeşe, her tim li paş xwe dinêre.<br>Tîna li ku maye? |
|  | Tînayê heta niha gelek tûşêmî xwariye.<br>Ew ji xwe re dibêje, "Niha divê ez zû vegerim."<br>Lê gava ew digihîje xirbeyan, jixwe her kes çûye.<br>Tîna gazinan dike. "Lanet be! Ew di kîjan rê de vegeriyan?“<br>Sê rê ji xirbeyên wêran dest pê dikin. Tîna rêya çepê hildibijêre.<br><br>Ew bi qasî ku dikare zû dibeze. Yên din li ku ne? |

| | |
|---|---|
|  | Di dawiyê de Tîm radiweste. Divê ew çi bike?<br>Gelo divê ew ji Xanim Bodeyê re bêje ku Tîna winda ye?<br>Lê paşê divê ew li xwe mikur were ku wî du hijmar gotiye.<br><br>Xanim Bode dibêje, "Tîm, tu xwe diewiqînî. Were!" Tîm hêdî hêdî dimeşe. |
|  | Tîna direve û direve. Daristan her ku diçe gurtir dibe.<br>Ew radiweste û li dora xwe dinêre.<br>Li derekê çiqilek dişkê. Dengê xişexişê ji nav devî tê.<br>Tîna ji tirsan bêhna xwe digire.<br>Kîroşkek ji nav deviyên li pêşiya wê baz dide.<br>Bi rihetî direve, vedigere kavilan.<br><br>Li wir ew rêya navîn digire. Ma ew rêya rast e? |
| | Tîm êdî nikare xwe ragire.<br>Gazî dike, "Xanim Bode, raweste! Tîna winda ye."<br>Û ew vedibêje, ka wî çi kiriye.<br>Xanim Bode qet hêrs nabe; ew tenê pir, pir dikeve heyecanê.<br>Ew fermanê dide, "Zû vegerin! Bila her kes bang li Tînayê bike!"<br>"Divê em Tînayê bibînin. Her kes gazî dike, her kes paşve direve.“<br>Lê Tîna ne li xirbeyan û ne jî li tûşêmiyan e, û bersivê jî nade.<br>"Xwedayê min! Çiqas xirab e!" Xanim Bode dibêje. Ew hema bêje digirî.<br>"Divê ez gazî polîsan bikim, çareyeke din ji destê min nayê." |

| | |
|---|---|
|   | Xanim Bode diqîre, "Divê em ber bi otobusê ve bilezînin. Telefona min a destan li wir e."<br>Hemû zarok heta ku digihîjin otobûsê direvin. Li wir Tîna li kêleka şofêr rûniştiye!<br>Xanim Bode diqîre. "Tîna!" Tîna, tu ji ku hatî vir?" |
|   | Tina bi nermî dibêje, "Ez winda bûm. Xanim Bode, ez pir xemgîn im. Ez pir tirsiyam."<br>Xanim Bode dibêje, "Tirsa min hîn mezintir bû.“<br>Tîm dibêje, "Lê ya min herî mezin bû!" |
|   | Dawî |